



Projeya " Mafên Mirovan Ji bo Her Kesî " di binê bernama " Civaka Sivil Li Ser Kar in " ji aliyê Yekîtiya Ewropayê (YE) " tê finanskirin û digel KISA weka hevparî ji aliyê MHD'ê tê pêkanîn.

Projeya kû sê salan wê berdewam bike li ser armanca tekoşîna li dijî nijadperestî û parastina mafên mirovahi ji bo Penaberan tê sazîkirin.

Di nava çalakîyên serekeyê projê li ser civakên sivil û sazî û rêxistinên xwedî biryar ji bo standartên girtinên penaberî, perwerdeyî li dijî îşkencê û mûamelaya xirab, amadekarîna sê raporên tematîk li ser mafên mirovahiya penaberan, komxebatên li ser mafên aborî, sosyal û çandî ji bo penaberan, di roja

tekoşîna li dijî cûdahîya nijadî Navnetewî, kampanya ji bo zêdekirina hişmandî, di Qibrîsa yekbûyî de panelên li ser polîtîkayên koçberî û penaberî, bi dilxwazî çêkirin û tevlibûnê kampên havînê û li bakûrên Qibrîsê gorandinên qanûnî ji bo parastinê di nava bernamê de çîh dibîne.



rra.hr4all@gmail.com



facebook.com/mhd.humanrightsforall/



Ev weşan bi alîkariya Yekîtiya Ewropayê (YE) hatiye amadekirin. Ji naverokên weşanê tenê Komela Mafê Penaberan (MHD) berpîrsiyare û naverok ne daxuyanîya fikrên Yekîtiya Ewropayê ye.



14 Ferruh Cambaz Kolan, Köfklüçiftlik,
Nikosia , Qıbrıs



+90-392-22-84-910



rracyprus@gmail.com



facebook.com/MulteciHaklariDernegi/



instagram.com/rracyprus/

MAFÊ XWE ZANIBIN !

Li Bakûrê Qibrîsê Mafên
Penaberan û Penaberî

MAFÊN PERWERDEYÎ

Li Bakûrê Qibrisê bi qanûnî, bêyî statûya koçberî an jî zayendî, hemû zarok xwedî mafê girtina perwerdehiya bingehîne.

Perwerdeya mecburî û bêpere ji dû astên cuda çêdibe û 8 sale. Ev sîstem asta yekemîn weka 5 sal dibistana seretayî (1,2,3,4 û 5) û asta duyemîn 3 sal dibistana navîn (6,7 û 8) hatiye seraskirin.

Ji bo zarokên temenên wan 4 û 5 sal in ji aliyê dewletê perwerdeya pêşdibistanê bêpere tê danîn. Tevlîbûn ne mecburiyê lê tê pêşniyarkirin.

Zarokên ku xwendina 8 salan biqedînin, dikarin dest bi dibistana amadehiyê bikin. Dibistana amadehiyê 4 sale (9,10,11,12) û li dibistanê dewletê bêpereye. Li dibistanên dewletê ev perwerdehî weka xwendina giştî, bêşekarî û teknîkî tê danîn.

Zarokên pêdiviyên taybet hebin, di temenê perwerdehiya mecburî de xwedî mafê xwendina xwe li dibistanên taybet bigrine. Ev dibistan li bajarê Lefkoşa/Nîkosîa û Girne/Kyrenia hene.

Zarok dikarin bi kaxizê navnişanê diyar dike (fatore, kaxizê ji mixtar hatiye girtin), nasnameya wan an dê û bav, an jî belgeya penaberî dikarin li heremên bi cih bûne xwe li dibistanek binivîsin.

Bi tenê Koleja Maarîf a Tirk (Türk Maarif Koleji) xwendinê bi zimanê Îngilîzî dide, yê din hemû, dibistanên dewletê bi zimanê Tirkî perwerdehî dikin.

Zarokên ku li dibistanên dewletên dixwînin ger şertên serkeftinê bi cih binin, dikarin diploma bistînin.

LÊNÊRÎNÊN TENDURISTIYÊ

Penaberji hemû lînêrînen tenduristiyê ji aliyê dewletê tîn danîn bêpere xizmet distînin.

Avabûnên tendurustî ê li Lefkoşa/Nîkosîa, Akdoğan/Lysie, Güzelyurt/Morphou, Maraş/Varosha, Mehmetçik, İskele/Trikomo, Serdarlı/Tziaos, Yenierenköy/Gialousa, Geçitkale/Lefkoniko, Dipkarpaz/Rizokarpaso, İnönü/Sinta, Değirmenlik/Kythrea, Esentepe/AgiosAmvrosios, Lapta/Lapithos, Tatlısu/Akanthou, Lefke/Lefka, Akıncılar/Louroujina, Çamlıbel/Mirtu û Dilekkaya/Agianikan weka avabûnên pengava yekemîn ê Tenduristiyê ne. Li van cihan û nexweşxaneyê Xanîkan xizmet, lînêrîn û rehabilitasyon bêpereye.

Nexweşxaneyê Dr. Burhan Nalbantoglu ya Lefkoşa/Nîkosîa, Nexweşxaneyê Dewletê ya Mağusa/Famagusta, Nexweşxaneyê Akçiçek Dewletê ya Girne/Kyrenia û Nexweşxaneyê Cengîz Topel Dewletê ya Güzelyurt/Morphouyê weka weka nexweşxaneyên pêngava 2'yemîn û 3'yemîn û li ev cihan tenduristî bêpereye

Ji bo hûn karibin van mafa bi kar binin, divê ji MHD'ê kaxizek weka nîşana endamiyê bigrin û li van avabûn û saziyên tenduristiyê qeyda xwe çêbikin.

Ger hûn bi Tirkî nizanin, divê verger digel we heb. Alîkariyên vergerî ji aliyên wan saziyê nahê danîn. Ger hû nikarin verger peyda bikin, hûn dikarin xwe bigêhênin MHD'ê ji bo alîkarî.

Dermanên ji aliyê bijîşk hatibin reçetekirin û li embara saziya tenduristiyê hebe bêpereye. Ku dermanên reçeteyê li saziyê tinnebe, û rewşa we ya aborî netêr bike, hûn dikarin sêrlêdana Komela MHD'ê bikin ji bo alîkarî.

GEHÎŞTINA BAZARA KAR

Penaber Xwedî destûr standina kar û hemû mafên weka hemwelatîyên Cihana sêyemîn, dikarin li sazi û kargehên legal de bixebitin. Bê destûrê xebat qedexeye. Hem karker hem jî Karsaz tê cezakirin.

Belgeya Parastina Navnetevan kui aliyê UNHCR (Komîsyona Bilind a Penaberan Neteweyên Yekbûyî) ku bigêhênin Daîreya Xebatê, penaber ji pêşdestûra ku ji bo hemwelatîyên Cihana sêyemîn azad dibin.

Daxwaziya destûrdayina xebatê ji aliyê karsaz tê xwastin û destûr ji bo hinek kargeh an jî xaniyan e, Destûra xebatê li ser nasname an jî passportê tê eşkere kirin.

Ger hûn ji kar derkevin destûra xebatê berdewam be jî tê rawestandin û hûn nikarin li cihekî din bixebitin. Ku hûn bixwazin li cihekî din bixebitin divê karsaz ji bo we daxwaziya destûrê bike.

Di nava hefteyekî de, demên xwarinê me di nav de, ji 40 seetan zêdetir xebat qedexeye. Car caran rewşên taybet çêdibin, ji bo vî jî heqê demên zêde divê were dayîn û divê ev deman kêmtirên 14 seetan bin. Roek ji heftê divê ji bo îstirehetê be û ji 6 mehan 14 roj xwedî rojên îstirehetêne. Di van rojan de pere tê standin.

Bingeha pere ji aliyê Hikûmetê tê diyar kirin, û karsaz nikarin kêmtirê bingehê bidin xebatkaran. Karsaz divê her meh pîrîmên sigortayê razîne. Ku neke li ser wî cezayê pere tê birînê.

Qezayên kargehî, qezayên ku di nava cihê karker bixebite an jî li ser xebatê lê ne li kargehê ne. Karsaz xwedî berpirsiyare dema qezayên kargehî çêdibin û nexweşiyên wê demê û paşê derkevin holê. Divê karsaz di nava sê rojan de agahî bi de Daîra Xebatê. Ku karsaz ne ke hûn jî dikarin bi serê xwe bikin.